# Nehêle derbasî te û kesên din bibe

Folkhälsomyndigheten



## Gelek caran destê xwe bişo!

Maddeya vegirtinê bi hêsanî bi destê mirov ve dizeliqe û ji wir dikare li ciyên din belave bibe. Gelek caran destê xwe bi sabûn û ava germ bişo, bi kêmanî 20 saniye. Gava sabûn û av tunebe, hingê dikarî alkola destşûştinê bi kar bînî.



## Li nav qermûçeka milê xwe bikuxe û bipişke!

Heger tu li nav qermûçeka milê xwe yan li nav destmaleke kaxezê bikuxî û bipişkî, hingê tu nahêlî dilopên biçûçik ên bi maddeyên vegirtina nexweşiyê li der û dora te belave bibe yan bi destê te ve bizeliqe. Her dem wê kaxezê bavêje nav qutîka ziblê û destê xwe bişo.



## Destê xwe nede çav, poz û devê xwe

Dibe zehmet be ku mirov wisa neke, loma destê xwe gelek caran bi sabûn û avê bişo, da ku van maddeyên têger ji destê xwe pak bikî.



## Gava nexweş bikevî li malê bimîne!

Gava nexweş bî li malê bimîne. Hingê nexweşiya xwe li kesên din nalewitînî.

!

**Maddeyên vegirtina nexweşiyê li her derên hawîrdora me heye.**

**Pakgirtina destan awayeke herî hêsan e bo parastina te û kesên din ji nexweşiyan.**

**Riya belavekirina vegirtina nexweşiyê ya herî normal, bi destê mirovan çêdibe.**

FOLKHÄLSOMYNDIGHETEN, 2020 ARTIKELNUMMER: 20032-13 UNDVIK SMITTA, KURMANJI A4 GRAFISK PRODUKTION: ETC KOMMUNIKATION